# SÊVÎN YAN SÊVMÊXEK YAN JÎ SÊVA MÊXEKRÊJ.

## Pêşekî:

Kurdistana mezin anku her ji jêriya Zagrosê ta joriya Zagorosê û Torosê û berjêra wê jî ku Mezopotamiyaya mezin e, hêlîn û warê şaristanî, çand û bûyerên mirovahiyê ye. Kurd ku yekane mîras û kom mirovên vê paşxan û barxana 12 bo 13 hezar salên tevgerên vê dêrok û şaristaniyê ye, bêguman mîtolojî jî ciheke mezin û kûr digire. Mixabin ji ber gelek sedem û doxên cur bi cur Kurd nizaniye û nikariye jî nirxên xwe yên dêrokî rave û şîrave bike. Netewên ku axa Kurdistanê dagirkirine, ew tenê ax na, ziman, çand, dêrok, destan û mîtên Kurdî jî hemû talan û tajan kirine. Sêva Mêxekrêjê jî yek ji wan kok û kodên Kurdî ya çandî ye û di kevneşopiya Kurdî de ciheke diyar digire. Lê ew çanda Kurdî jî weku her nirxên din ên Kurdî çi qasî ji destê dagirkerên Kurdistanê hatibe hewl dane bidizin.



## Pênase:

Sêvmêxek yan jî Sêva mêxekrêj koka wê ji Zagros û Loristan ta Erdelaê ye, kirin û pîrozkirina wê jî her li wir maye û jînda ye. Ta niha jî Sêva Mêxekrêj heye ku dêroka wê digihîje nêzî 100 sal bi taybetî li Rojhilata Kurdsitanê.
Di mîtolojî û çanda Kurdî de sê mêwe xwedî wate û ramanên xwe yên taybet in ku ew jî “Henar, Nareng(Portuqal) û Sêv”ê ye, Henar sembol û ramana bûn, diyaikbûn û dayik û cîhanê ye, sembola jidayik bûna nûr û mîtrayê ye di şeva Yeldayê de û Yelda bê Henar nabe û netemame, nareng(portuqal) sembola xêr û bereketê ye ku di cejn û şeva Yeldayê de li herêma Kirmaşaê li Loristan û Zagrosê, ev nerît tê pîroz kirin, sêv jî sembol û ramana hezkirin û evînê ye.  Sêva Mêxek ku bi awayê “Sêva Mêxekrêj”ê jî tê gotin, anku Sêva bi mêxek(qalafir)ê tê rêjtin, weku “Sêvîn” anku sêva vîn, eşq û evînê jî sembola “Vîn, Eşiq û evîn”ê û

“wîsal û nemana fîraq”ê ye, bi wateyeke dî, sembol û ramana “Aştî û hevbûn”ê ye, divê em vê yekê jî bizanin ku sêv di warê mîtplojiyê de nîşana fîraq û dûrketin yan jî cuda bûnê bûye, lê di heman demê de nîşana eşq û vîna wîsalê û gihiştinê bûye. Keç û kurên hezgîn zêdetir û dû re di neqeba heval,  nas û malbatê de weku diyarî û gihandina vîn û hez kirinê yan jî bi mebesta aştî û dûrnebûnê şandine ji hevdu re.

Awayê Sêvmêxek yan jî Sêva Mêxekrêj:

**Sêv**: mêweyeke di du werzên Havîn û Payîzê de digihîje û weku mêweyeke sereke di jiyana Kurdewarî de bo gelek mebetên xwarinê jî hatiye bikaranîn weku “Sirke, Xel, Hişk kirin, Rîgil û Murebax, çêşt. Sêv di çanda Kurdî û piraniya neteweyên din de nîşana aştî û tendurustiyê ye. *Sêv di jiyana mirovahiyê de roleke mezin dîtiye ku yekem sêv ew sêva “Meşî û Meşîyane” yan jî “Adem û Hewa”yê bû li behiştê, duyem sêva serê Nîyoton bû ku kete xwar û sêyem sêva Stiyu Jabz û kompanyaya iphone’ê.*

**Mêxek**: berê dareke hertim kesk e, guleke sor a dirêjok û çargoş e, bêhene xweş û berdewam dide, bilindiya darê 10 bo 12 metro ye û hin car nêzî 20 metroyê jî dibe. Şikila wê dişibe mêx(mîx, bizmar)ê, lew Kurd jêre dibêje “Mêxek” hin çavkanî koka wê vedigerînin giravên welatê Andonosyayê. Mêxek di nava çanda Kurdewarî û bi taybetî jinên Kurd de ciheke mezin digire û bo gelek mebestên xişil û şengkariyê tê bikaranîn weku milwank, nexşên serbend û destbend û pêbend yd... Lê ji hemûyan taybetîtir rola wê ye di Sêva Mêxekrêjê de. Sêvmêxek ji sêveke sax û sor û mêxek(qalafir)ê tê çê kirin, lebên mêxekê di sêvê de diçeqînin heta hemû sêv winda dibe, dû re bo heyama bîst ta mehekê hişk dibe û weku xwe dimîne bi bêhn û rengê xwe, Sêva Mêxekrêj zêdetirî 100 salan dimîne sax û durust. Sêva Mêxekrêj bi piiranî di buxçikên pîrejin û nava dolab û taq(pencereyên biçuk di odeyê de) dihatin dîtin û hilgirtin. Niha jî li nava çiya û gundên Hewraman û Loristanê, li herêma Erdelan û Mukiryanê, di piraniya buxçik, dolab, taq, ref û kuncên malan de “Sêvmêxek” heye û bêhn û berama wê di her kuncekê ode û malê de tê û dîrok û çîrokên hezaran hezar dildar û vîndar vedibêjin.

Li başûrê Kurdistanê:

Sêva Mêxekrêj ji aliyê Wezareta Pîşesazî ya Herêma Kurdistana Iraqê ve weku marka bo kompaniya “Vînsêv” hatiye tomarkirin û ji aliyê Desteya Giştî ya Geştûguzerî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve bi fermî weku sembol û diyariya kurdî hatiye naskirin û tê jînde kirin. Peykertaşê Kurd “Seywan Seîdiyan” weku ew bi xwe dibêje: di sala 1999an de ez ji dayika xwe zîz bibûm, dayika min sêveke mêxekrêj ji min re şand weku nîşana aştbûnê, ew bala min kişand û min pirsî, înca min wê koda Kurdî û kevnare nas kirin û li ser kajîm(xebitîm). Di sala 2023an de bi awayeke gelenperî dest bi çalakiyên Sêva Mêxekerêjê hatine kirin û berdewam e. Niha Kurd Sêvmêxekê di du cejn û boneyan de weku sebola wê

rojê bikartîne ku ew jî di “Şeva Yelda”yê de ku cejna Mêhr û Mîtra ye û cejneke Kurdewarî û kevnar e, ligel roja Valantayinê ku roja evîndariyê ye.





**Rola wê di warên curbicur de**:
Sêva Mêxekrêj di gelek waran rola mezin û berçav dibîne weku warên Wêjeyî, Hûnerî, Sînemayî, Siyasî, Olî, Civakî û nivsî de.
Gelek helbest û roman û çîrok hene ku Sêvîn yan jî Sêva Mêxekrêj karektera sekrekî ye. Her weha di alana hûnerî û sînemayî de sêvîn roldar e, yek ji wan fîlma sînemayî ya Kurdî “Hezar û Yek Sêv”e ku sêva mêxekrêj rola sereke dibîne. Her weha di çendîn war, bone, qadên din de “Sêva Mêxekrêj” hevîna wê bûye weku sembol û mebesta aştî, hevjiyanî û hevheziyê.



Encam:

1.Sêva Mêxekrêj weku çand û kodeke yekane Kurd û Kurdewarî xwedî dêrokeke kûr û hûr û dûr e. Lê mixabin ji ber ku Kurd jiyan û hebûna xwe arşîv nekiriye û dagirkirin û şerên berdewam û jînosîdên Kurd di her warên jiyanê de, bûne sedem û faktorên mezin ku Kurd ew qasî mijûlê man û nemana xwe be, ew qasî mijûlê nirxên xwe yên heyî nebe, dagirkerên Kurdistanê jî berdewam ligel jînosîdên xelkên Kurd û dagirkirina axa wan, çand û kok û kodên wan jî talan û tajan kirine û xwastine bi çand û kodên xwe ve lehîm bikin û ji gelê Kurd veqetînin.

2.Hê dane û belgeyeke şênber berdestê me nîne ku kok û kûrahiya Sêva Mêxekrêj ji me re nîşan bike, di nava olên Kurdî de jî zêde berçav nayê dîtin, lê ku yekane çand e di nav Kurd de û li herêmên Zagrosê jînda ye bi dirêjahiya sedan û hezaran sal e, ew ji me re wê rastiyê dibêje ku yekane çanda Kurdî ye.

3.Ew çand belavê neteweyên derdor nebûye û heta derbasî milên din ên Kurdistanê jî nebûye û zêetir li herêma Zagrosê jînda bûye, van salan hêdî hêdî derbasî milên din ên Kurdsitanê bûye ku ev cihê dilxweşî û teqdîrê ye.

4.Sêva Mêxekrêj ku sembola evîndarî û aştiyê ye, niha di her warên jiyanê de watedar  eû weku diyarî di wateyên cur bi cur de tê şandin û diryarî û hediye kirin.

Lêkolîn û Nivîs: Qendîl Şeyxbizînî
4.10.2023